Parçên payîzeka dereng

Bilind Mihemed

Singê te payîzeka derenge û
Tiblên min yên westiyayî
Bo lêvên qeşav girtî û
Maç kirina te dewraneka!
Heku şevê dadda!, çavên min diçûne paxlên te û
Bêhna mêyatiyê zeviya singê te bi kola radiêxist
Min diviya pitir nêzîk te bibim
Tu dibûye leylan.
Li pişt rojê...
Textê min û te dihat danan
Tiblên min mêrga leşê te diçerand,
Ji nişkave
Şaşkeka
Simbêl şor
Di xeweka kûr day û
Ez yê li dûv leylana te dibezim!
Bêhnê
Aramiya te têk dida
Bi rex cihê min ve rûbareke
Weku şehmaran min digevêzit
Min ser av dike,
Bin av dike
Têrbûn ji lêvên te tineya
Di benda stiraneka aviz da
Me di stirand...
Tu hemî tiştî û
Û hemî tişt ji teye,
Parçên leşê min samba dikirin,
Giropên xwînê ji navêk vediqetiyan!

Singê te payîzeka derenge û
Tiblên min xewna pêve dibînin!
Rewîna ((sa)) gûleyeka bi tirse
Min ji hembêza te direvînit
Kê tu birî?!
Kê ez ji karwanê eşqa te veqetandim?!

Singê te payîzeka derenge û
Di bin tizbyên sofiyan ve xwîna dibarit!
Balinde yên daddin
Balinde yên radibin,
Di nav payîza singê te da
Payîzeke xewna mina yekaneye
Çîblaq dihête zincîrkirin!